

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT









## XWÎŞK Û BIRAYÊN DELAL !

Em, ji bo ku zarokên Kurdan hînî xwendin, nivîsandin û peyvên kurdî bibin, kovareke kurdî çap dikin.

Em dixwazin, ku hun wextê xwe yê vala bi mamik û listikên xweş re derbaz bikin. Em hêvî dikin, ku hun jî alî me bikin û alîkariya xwe ji me re rê bikin. Hingê em ê bi hev re kovareke zarokên Kurdan, yeke mezin û baştir, çap bikin.

Vê carê, ji ber ku cara pêşîn e û em bi tenê çend kes bûn, dê kêmasiyên me jî pir bin. Em ji we hêvî dikin, ku hun kêmasiyên me ji me re bêjin. Em çavnêrên nameyên we ne.

Bi silavên zarokên Kurdan !

Komîteya Kovara

KULÎLK

ya Zarokên Kurdan

## ÇIMA K U L Î L K ?

Îro, li derveyî Kurdistanê, bi qasî 200-250 hezar Kurd hene. Piraniya wan karker in. Hin ji wan tevî mal û malbata xwe ji welêt derketine û derbeder bûne. Hemû jî, li welaten dereke, xwêdan û keda destên xwe difroşin da ku pê debara xwe bikin.

Rewş û pergala karkerên xwedî mal, zar û zêç qet ne baş e. Herçendî ew vê gavê dikarin pariyek nên bi dest bixin jî, lê dîsan, rojên tarî li pêşiya wan in.

Heçî rewşa zar û zêçên karkerên Kurdan yê li derveyî welêt e, gelekî dilsoj e. Dijwar û xemdar e. Zarok ji xwendin, hînbûn û zanînê bêpar in û jê pir bi dûr in. Ew, wek li welêt, dîsan di şereşa tarî ya nezaniyê de ne. Çavgirtî ne, çavgirtî dimînin û çavgirtî û nezan tên hîştin.

Li welatên ku karkerên Kurdan tê de dimînin û li wê dixebitin, bi tenê li welatekî mafê bi zimanê zikmakî xwendina şagirtên dereke heye. Ev welat jî Swêd e. Anî, zarokên dereke xwedî maf in, ku di dibistanên swêdî de bi zimanên xwe bixwînin. Ev mafekî wan î desturî û qanunî ye. Ji ber vê yekê jî, li Swêd, zarokên Kurdan jî xwedî maf in, ku di dibistanan de bi zimanê xwe yê zikmakî bixwînin. Ji lewre, zimanê kurdî jî wek zimanekî dereke û resmî, di nav zimanên dereke yê curbecur de cîhe xwe wegirtiye.



Ev çend sal in, ku zarokên Kurdan yê li Swêd, serfiraziya bi zimanê xwe yê zikmakî xwendinê diçêjin. Herçendî ne li gor daxwaza dil e jî, lê dîsan ji pêşvebirina zimên re kêseke hêja ye. Bi vî rengî, zimanê kurdî di dibistanên li derveyê welêt de û ne di bin nîrên koledariyê de, kêsa bişki-vîn û geşbûnê dibîne.

Ev kovara ha, yek ji fêkî û berên vê bişki-vîn û geşbûnê ye. Ji lewre jî, divê ew dahat û berhemeke xwedî rûmet û hêjabûneke pir giranbiha bête dîtin û pejirandin. Sebeb jî ev e, ku ev kovar keda destên şagirtên Kurdan e. Şagirtan bi xwe û li gor karîna û zanîna xwe ev kovar afirandine.

Dive ez bêjim, ku kêmasiyên wan pir bûn. Lê min nedixwast, ku hewasa wan bête şikandin. Bervajiyê vê, min xwast, ku ew bi dilekî şad, bi hewaseke kûr û bi xwîneke germ xwe pê mijûl bikin. Wek mamoste, divyabû ku ez wisan jî bikim... Lê min di hin tiştan de alîkariya wan kir. Nivîsarên wan, ji aliyê nivîsînê û rêzimanê ve, di gel wan rast kirin. Pêşneyar, dîtin, bîr û baweriyên xwe ji wan re gotin. Wan jî bi a min kirin. Herweha, min nivîsarên kovarê ji wan re bi tîpnivîsê nivîsîn û rûpelên kovarê saz kirin. Bi vî awayê kovara KULÎLK pêk hat. Hevalên KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ-LI SWÊD jî xwe dan ber çapa kovarê. Ji vir û bi ha de jî, ew e KULILK-ê çap û belav bikin.



KULÎLK gulek e, ku hîn nû digihê. Hiş û mêjiyên KULÎLK-ê jî şagirtên Kurdan in. Anî, zane u birewerên pêşerojê yê Kurdistanê. Ew, KULÎLK-ê jî bo zarokan dinivîsin û diweşînin, da ku ew jî hevparen bêhna gulavîna ya KULÎLK-ê bin. Ew, jî piçûk û mezin, dê û bav, xwîşk û birayên xwe diwaxazin, ku KULÎLK-ê li ser destan bigerînin. Bixwînin û bidin xwendin. Wek bav û bapîrên me gotine;

"Dinya gulek e, bêhn bike û bide hevalê xwe..."

Çêkroxên kovara KULÎLK-ê jî we hemûyan, çî mezin û çî piçûk, hevî dîkin, ku hun jî wan re binivîsin. Dîtin, pêşneyar, bîr û bawerî û rexneyên xwe jî wan re binivîsin û wan pê bidin zanîn.

KULÎLK, dê bi alîkariya we ve bijî û xwe xweştir û baştir bike. Ji lewre, çavên wê li destên we ne!..

Bi destûra we xwendevanan, dixwazim sipasên xwe yê dilgir pêşkêşî şagirtên xwe yê ku ev kovara ha ya spehî afirandin û herweha hevalên Komela Çanda Karikerên Kurdistanê - Li Swêd yê ku bi çapa kovarê rabûn, bikim.

Mamostê kurdî














Ey keça Kurd, nû gihame, tim dixwazim pêşveçûn  
Doz û daxwaza me, her dem tac û ala serxwebûn
















# ALFABEYA KURDÎ

TÎPÊN MEZIN	TÎPÊN PIÇÛK	WÊNE
A	a	 AL
B	b	 BEQ
C	c	 COT
Ç	ç	 ÇAV
D	d	 DEV
E	e	 ENÎ


TÎPÊN MEZIN	TÎPÊN PIÇÛK	WÊNE
Ê	ê	 ÊZING
F	f	 FIND
G	g	 GUL
H	h	 HESK
I	i	 INCAS
Î	î	 ÎSOT





J	j	 JIN
K	k	 KER
L	l	 LÊV
M	m	 MÊR
N	n	 NAN
O	o	 ORDEK
Q	q	 QAZ

P	p	 PÎVAZ
R	r	 ROVÎ
S	s	 SÊV
Ş	ş	 ŞÊR
T	t	 TIFING
U	u	 KURÊ ↑ GULÇÎNÊ ↑



Û	û	ÛR 
V	v	VIZIK 
W	w	WERÎS 

X	x	XANÎ 
Y	y	YEK <b>1</b>
Z	z	ZAROK 

## XWENDINA KURDÎ Û ÇEND RÊZIK

Navê min Hêlîn e. Ez Kurd im. Ez diwazdeh salî me. Du hevalên min hene. Navê yekî Fernando ye û yekê jî Elisabeth e. Fernando Îtalî ye. Lê Elisabeth ne Îtalî ye. Ew Înglîz e. Em bi swêdî di gel hev dipeyîvin. Em hersêk jî swêdî baş dizanin. Ev bûn çar salên min, ku ez ji Kurdistanê derketim. Lê min kurdiya xwe ya şêrîn ji bîr nekiriye. Divê mirov zimanê xwe yê zikmakî ji bir neke. Mirovên qenc û kurdperwer her dem bi zimanê xwe dipeyîvin û bi zimanê xwe dinivîsin. Şerm e, ku mirov zimanê xwe nizanibe.






Koledar, xwedîmal, tev dilşad, tev dilxweş  
Em tenê perîşan, belengaz, ser bi reş  
Bê rêber, bê rêzan, bê dewlet, bê serdar  
Bê xwendin, bê ziman, bê rûmet, tev hejar  
Berdan ser piştta me dijmin pir lat û hîm  
Newêrin em bêjin li ber wan lam û cîm  
Navê me, zarê me, qada me tev dizin  
Dixwazin her weha em bimrin bi rizîn



## WÊNE Û KÊMASIYÊN WÊ



Herdu wêne jî wek hev in. Lê di wêneya jêrîn de 10 tişt kêma in. Li wan kêmasiyan bigere, bibîne û çêbike !





## KÊÇ Û SPÎH

Carekê kêç û spîhek hebûn. Herdu bûn xwehên hev. Rojekê kêçê gote spîhê, ku "Ez ê herim û gundor (bagirdan, bangêr, lox) bigindirînim." Kêçê baz da û çû û gundor gindirand. Lê di bin de ma û mir. Gava spîh çû û dît, ku kêç di bin gundor de maye û miriye, dest avêtin keziyên xwe û ew jê-kirin. Bi dû re berê xwe da ber bi malê. Qijik hat nik wê û jê pirsî:

- Çima tu kezîkur î?

Spîhê bersiv da û got:

- Ez kezîkur, xweha min kêç di bin gundor de ma û mir.

Qijikê jî dûvikê xwe kişand, firî û çû serê darê. Darê ji qijikê pirsî û got:

- Çima tu dûvkişên î?

Qijikê lê vegerand û got:

- Ez dûvkişên, spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin gundor de ma û mir.

Darê jî pelên xwe bi ser avê de weşandin. Avê ji darê pirsî û got:

- Çima tu pelweşên î?

Darê li avê vegerand û got:

- Ez pelweşên, qijika me dûvkişên, spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin gundor de ma û mir.

Avê jî xwe di ser garis de şilo-milo kir. Garis ji avê pirsî:

- Çima tu şilo-milo yî?

Avê bersiva gêris da û got:



- Ez şilo-milo, dara me pelweşên, qijika me dûvkişên, spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin gundor de ma û mir.

Gêris jî serê xwe tewand. Xwediye gêris hat û ji gêris pirsî:

- Çima tu sertewên î?

Gêris li xwediye xwe vegerand û got:

- Ez sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijika me dûvkişên, spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin gundor de ma û mir.

Xwediye gêris bi hêrs ket, rabû û çû marek girt û xiste xwe. Piştî keça wî hat ba bavê xwe. Sîtilek mast pê re bû. Dema ku wê rewşa bavê xwe dît, lê vegeriya û got:

- Yabo, çima tu mareqûn î?

Bavê keçikê bersiva wê da û got:

- Ez mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijika me dûvkişên, spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin gundor de ma û mir.

Keçikê jî mast bi serê xwe de kir û çû mal. Gava ku diya wê ew dît, jê pirsî û got:

- Delala min, ka bêje, çima tu serbimast î?

Keçikê bersiva diya xwe lê vegerand û got:

- Ez serbimast, bavê min mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelwe-



şên, qijika me dûvkişên, spîha me kezîkur,  
xweha me kêç di bin gundor de ma û mir.


Diya keçê jî rabû û li ser sêla sor rû-  
nişt. Cîrana wê hat û jê pirsî û got:

- O cîranê, çima tu qûnbisêl î ?

Wê li cîrana xwe ve gerand û got:

- Ez qûnbisêl, keça min ser bimast, mêrê  
min mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-  
milo, dara me pelweşên, qijika me dûvkişên,  
spîha me kezîkur, xweha me kêç îro di bin  
gundor de ma û mir.

Cîranê jî bendek ji xwe re dît û xwe  
pê bi dar ve kir.




Roja ez çêbûme, min dîn ev deşt û lat  
Rojek nû, rûsipî min dî zû lê hilat




Bo me her dem divê pêşveçûn û xebat  
Koletî min navê, min divê tim felat



# MIJÛLÎ



Şivanê pêz dixwaze  
here ber pezê xwe.  
Lê rê nas nake.  
Çûk jî dixwaze here  
ser hêlîna xwe. Lê  
ew jî rê nas nake.  
Gelo tu dikarî alî-  
kariya wan bikî û  
riyên wan bi wan  
nîşan bidî?



Gelo navê vî zarokî  
çi ye?  
Tîpên ku navê wî jê  
pêk tên, li ser çav  
û rûyê wî belakirî  
ne. Heke tu wan tîpan  
bighînin hev û lê bi-  
xebitî, tu ê navê wî  
derxî.

## EM Û DIBISTAN

Ez ji dibistana xwe gelekî hez dikim. Ew li ba dilê min pir delal e. Em li wê hînî xwendin û nivîsandinê dibin. Xwe têdigihişîn û zanîna xwe pêşde dibin. Em Kurd divê xwe gelekî têbigihişîn. Da ku gelekî zane û jîr bin. Heke em wilo nebin, dê nezanî û zordarî serên me bixwin...

Ez di sinifa pêncan de dixwînim. Di sinifa me de bîst şagirt hene. Em hemû, wek xwişk û bira, ji hev hez dikin. Rûmeta hevdu digirin û bi çavekî baş li hevdu dihêrin. Ji lewre, mamosta me jî ji me hez dike. Gava em tiştekî têngihên yan jî nizanibin, em ji wê dipirsin. Ew jî bi kefxweşî bersiva me dide. Serê xwe bi me re diêşîne. Di sinifa me de şeş zarokên dereke hene. Herçendî em ji zarokên Swêdiyan ne bi şûn de ne jî, lê dîsan kêmasiyên me hene. Di nav van kemasiyan de, qenc nezanîna zimanê swêdî, kêmasiya me ya yekemin e. Lê, di vî warî de, mamosta me ya zimanê swêdî pir alîkariya me dike. Yan jî mamostê me yê zimanê zikmakî alîkariyê dide me.

Dersxaneyê me mezin û pir xweş e. Me dîwarên wê bi nexşe û wêneyên curbecur ve xemilandine. Her yek ji me xwediyê mêz û kursiyekê ye. Em mêz û kursiyên xwe pir paqij xwedî dikin. Mamosta me, hîn di roja








destpêka dibistanê de, pirtûk û pirtilûkên nû dan me. Pênivîs, rastkêş, jêbir, boyaxa avîn, firçe û qelemên rengîn jî dan me. Em van hûr û mûrên xwe dixin mêza xwe û tê de diparêzin.

Ez bi çûyîna xwe ya dibistanê ve pir serbilind im. Wisan pê dilxweş im, ku dikim bifirim. Lê gava welatê min Kurdistan tê bîra min, zarokên belengaz yê rût û tazî, tî û birçî, jar û nexweş tên bîra min, ez dişerpilim. Serê min dikeve ber min û basikên min dişkên. Xwêhdaneke sar di ser min de tê û lertzîn dikeve laşê min. Kêf û hewasa min direve û dilê min diqurmiçe. Mij li ber çavên min pêl vedide û hêstir ji kortalên çavên min difijiqin... Çi bêjim?.. Çi bikim?.. Bila mala koleyên kole-daran kambax be!..

Lê dilê min çiqasî bi kul û kovan jî be, ez tu caran ji xwendin û dibistana xwe sar nabim. Ji ber ku xwendin û dibistan birînên me derman dikin. Em, bi tenê, bi riya xwendinê ve dikarin zanebûna xwe pêşde bibin. Bindestiya me ji ber nezaniyê ye. Ji lewre, gava ku ez van tiştan didim ber çavên xwe, hewasa min radibe. Xwîna min germ dibe û kel pê dikeve. Ji ber vê yekê jî, ez ji her carî bêtir bal û dena xwe didim xwendina xwe. Çima?.. Ji bo ku ez dixwazim pir jîr û zane bim, da ku ji dê û bavên zarokên belengaz û welatê xwe re bibim pêşmergekî aza.

# XAÇEPIRS



1 D  
2 I  
3 B  
4 I  
5 S  
6 T  
7 A  
8 N  
9 E  
10 D  
11 E  
12 S  
13 T  
14 P  
15 E  
16 K  
17 I  
18 R



## HESEN QENDE

Hebû tunebû, mirovek hebû. Navê wî Hesen Qende bû. Rojekê, ew çû zeviya xwe, ku wê cot bike. Wî misîna xwe ya avê jî bi xwe re biribû. Gava wî fikir ku misîna xwe dayne kokelê, dît ku hirçek di kokelê de ye. Hirçê jî rûvê xwe kur fikir. Dema ku hirçê Hesen dît, jê lava kir û got:

-Ez ketime ber bextê te, ku tu ji kesî re nebêjî. Eger tu ji kesî re nebêjî, ez ê herşev dûveke mîhan ji te re bînim û ji rojîna mala te re bavêjim hundir.

Hesen Qende, piştî ku piçekî ponijî, li hirçê vegerand û got:

-Baş e, ez pê qayîl im. Min çî dîtibe, soz didim, ku ji kesekî re nebêjim.

Hesen Qende vegeirî û çû mal. Hirçê herşev dûveke mîhan, ji rojînê re, ji wan re diavêt hundir. Şevê jina Hesen Qende ji mêrê xwe pirsî û got:

-Ev kî ye, ku her şev dûveke mîhan ji me re tîne û ji rojîna malê re diavêje hundir?

Hesen Qende piçekî hizra xwe kir û paşê li jina xwe vegerand:

-Ew Xwedê ye, ku her şev dûveke mîhan ji me re tîne û ji rojîna malê re diavêje hundir.

Jina Hesen ma heyîrî û got:

-Na, bi Xwedê ew ne Xwedê ye. Divê tu ji min re rastiyê bêjî, ku ew kî ye.

-Heyran,wek min got,ew Xwedê ye.

-Eger tu ji min re راستiyê nebêjî,ez ê dev ji te berdim,ji te veqetim û mala xwe biguhêzim.

Li ser vê,Hesen Qende xwe nezîkî jina xwe kir û serê xwe xwar kir û devê xwe xiste guhê jina xwe.Bi dizîka ve û bi dengekî nizim jê re got:

-Xanim,ji kesekî re nebêje.Ew ê ku her şev duveke mîhan tîne û ji rojînê re diavêje hundir,hirç e.Gava ku ez çûme cot,min di kokelê de hirçek dît,ku rûvê xwe kur dikir.Wê ji min pir hêvî kir,ku ez ji tu kesî re nebêjim.Heke ez li ser gotina xwe bimînim,ew ê jî her şev ji me re dûveke mîhan bîne û wê ji rojînê re biavêje hundir.

Lê hirçê ji bixêriyê guhdariya wan dikir.Gava hirçê bîhîst,ku Hesen Qende çîroka wê ji jina xwe re dibêje,bi hers dikeve û bi dengekî bilind banî Hesen dike û dibêje:

-Hesen Qende,Hesen Qende ma ne ez ê rojekê te bigrim !...

Ji ber vê yekê,Hesen Qende êdî hew diwêriya,ku herê cot.Lê piştî du-sê heftan,ji neçariyê,ji mala xwe derket der û çû zeviya xwe ku cot bike.Hirçê,ku xwe veşartibû,ji nişkê ve ji cîhê xwe derket û xwe dirêjî Hesen kir.Bi dengekî bilind qêrî û got:

-Hesen Qende,ma ne tu va yî? Tu ê çawan ji ber lepên min rizgar bî?

Hesen Qende ji tirsan dest bi bazdanê kir.Lê çi feyde,hirçê ew girt.Hesen Qende



û hirç pevçûn. Herduyan jî pir li ber xwe dan. Di vê navê de, bi bêhemdî destên hirçê ketin ser hêlikên Hesên Qende. Wê jê pirsî û got:


-Hesên Qende, ev çi ne ?

Hesên li hirçe vegerand :


-Ew cewrikên se ne.

Hirç bizdiya û dest bi lavan kir û got:

-Hesên Qende, ez ketime ber bextê te, wan bigre û bermede, ku heta ez ji vir bazdim û bi dûr bikevim.




## MIJÛLÎ



Di vê wêneyê de, bi tenê du lib wek hev in. Gelo kîjan in?

Herdu çûkên jêrîn dane dû mozekê. Ji wan bi tenê yek xwe digihîne mozê. Gelo ew kîjan e?





## SÊVÊ

Allegretto

Min Sêv dî - to li ser sê - vê, Hey he - war, he -  
 - war, he - war, Min can dî - to  
 li ser sê - vê, sed he - war, kes ne - xun sê - vê.

Min Sêv dîto li ser sêvê,  
 Hey hewar, hewar, hewar,  
 Min can dîto li ser sêvê,  
 Sed hewar, kes nexwin sêvê.

Dîne dane li ber lêvê,  
 Hey hewar, hewar, hewar,  
 Dîne dane li ber lêvê,  
 Sed hewar, kes nexwin sêvê.

Min Sêv dîto li serê sûkê,  
 Hey hewar, hewar, hewar,  
 Min can dîto li serê sûkê,  
 Sed hewar, kes nexwin sêvê.

Dîne dane dest zarokan,  
 Hey hewar, hewar, hewar,  
 Dîne dane dest zarokan,  
 Sed hewar, kes nexwin sêvê.

Dîne dane ber neynûkan,  
 Hey hewar, hewar, hewar,  
 Dîne dane ber neynûkan,  
 Sed hewar kes nexwin sêvê.

M A M I K  
&++++++++&

Li vê jêrê çend mamik hene, ku divê hun bersivên wan yên rast bibînin. Di dawiya her mamikekê de cîhê bersivê vala hatiye hîştin. Di bersiva rast ya mamikê de çend tîp hebin, di wî cîhê vala de jî ewçend xal hene.. Her kî ku bersivên rast yên hemû mamikan ji me re bişîne, em ê jî xelatekê jê re bişînin.

Hem şil dike,  
Hem dîwêr qul dike.  
Gelo ew çi ye? .....

Kaniya qine-qinê,  
Mîr û hakim dest didinê.  
Gelo ew çi ye? ...  
Yan jî  
.....

Hesin, bizin,  
Gayê mezin,  
Tev dibezin.  
Gelo ew çi ye? ... . .....

Odeke şûşti-mûştî,  
Axekî tê de rûniştî.  
Gelo ew çi ye? ...



M A M I K  
&++++++++&

Av e, ne av e,  
Marê mirî di nav e,  
Teyrê zêrîn hindav e.

Gelo çi ye? .....

Kok di erdê de,  
Serî di te de,  
Orte di kerê de.

Gelo çi ye? .....

Ser bi jêr dibe, tijî dibe  
Ser bi jor dibe, vala dibe.

Gelo çi ye? ...

Şev tê, şemal tê,  
Gah tê, gopal tê,  
Ji nik padişah û siltanan tê.

Gelo çi ye? ....

Şaşika delalan, gindirî newalan.

Gelo çi ye? .....

yan jî

.....

Apê min tê ji deştê,  
Barek stirî li piştê.

Gelo çi ye? ....

Zimanê kurdî

Bi xemil, rewş e  
Şêrîn û xweş e  
Zimanê kurdî

Bi nexş û awaz e  
Letîf û naz e  
Zimanê kurdî


Gewgewê çiyar e  
Kubra teyran e  
Zimanê kurdî

Xezel, helbest e  
Şemdana dest e  
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye  
Sewta Xanî ye  
Zimanê kurdî

Şikoyê Hesên





Hejmarên piçûk bi yên  
 mezin ve yeko-yeko bighîne  
 hev. Ji ya herî piçûk dest  
 pêbike. Rastiya gotinan jî binivîse!

## RÊZIMAN Û RASTNIVÎSANDINA KURDÎ

Alfabeya herî baş ya ji bo nivîsandina zimanê kurdî, alfabeya latînî ye. Îro, kurdî ji bilî latînî bi du alfabeyên din ve jî tête nivîsandin. Yek ji van alfabe-yan erebî û yek jî kirîlîkî ye. Li Kurdistana Îran û Îraqê alfabeya erebî û Kurdên Sovyetistanê jî alfabeya kirîlîkî bi kar tînin.

Di alfabeya kurdî de 31 tîp hene. Ew jî di rûpelên 6, 7 û 8 an yên di vê kovarê de hatine berpêş kirin. Heke serê me bi zimanê me yê şêrîn ve bilind be, divê em alfabeya zimanê xwe qenc hîn bibin û biza-nibin. Bi alfabeya xwe binivîsin û bixwî-nin. Rastnivîsandina zimanê xwe hîn bibin û wê di nav Kurdan de belav bikin.

Berî her tiştî, di alfabeya kurdî de tîpên wek ğ, ǰ, ħ, ö, ü tune. Ew, yan bi tirkî yan jî bi erebî ne.

Tîpa -Ê-, mezin jî be û piçûk jî be, divê kumek, ano nîşana (^), li ser hebe. Nabe ku di şûna kum de nîşanên wek -´-(é), -`-(è), -ˇ-(ě), ---(ē) bên bi kar anîn.

Tîpa -Î-, mezin jî be û piçûk jî be, divê kumek li ser hebe. Nabe ku di şûna kum de nîşanên din bên bi kar anîn. Herweha, nabe ku -î- ya kurdî wek -i- bête nivîsandin. Ew tîp bi tirkî ye. Dirêjbûna dengê -î- ya kurdî û -i- ya tirkî ne wek hev in. Ji



lewre jî ne li gor kurdî ye. Heke bête bi kar anîn, dê zimanê me ji hîm û bingehên xwe yê rîzimanî pir tiştan winda bike.

Tîpa -l-, heke mezin be -l-, lê heke piçûk be divê wek -i- bête nivîsandin. Anî, di ya mezin de xal(.) tune. Lê di ya piçûk de heye. Nabe ku -i- ya piçûk bê xal bête nivîsandin. Ev deng di zimanê kurdî de tune. Ew bi tirkî ye. Herweha, ew bi tenê di zimanê tirkî de heye. Çawan ku di zimanên ewrûpî de ew deng û tîp tune, wisan jî cîhê wê di zimanê kurdî de tune. Ji lewre jî, divê em wê hîç bi carekê bi kar neynin.

Tîpa -û-, mezin jî be û piçûk jî be, divê bi kum be. Nabe ku di şûna kum de nîşanên din bên bi kar anîn.

Di alfabeya kurdî de tîpên qelew û şidandî tune. Ji lewre, nabe ku du tîpên bêdeng yê wek hev bên ba hevdu. Wek;

Ne - gulle - le - gule -

Ne - gurr - le - gur -

Ne - pennîr - le - penîr - û hwd.

Qelew kirin û şidandina deng û tîpan ji ber tesîra zimanê erebî ye. Li hin cîhên Kurdistanê, nemaze cîhên ku zimanê erebî hinde tesîrî kurdî ne kiriye, deng nayê şidandin û qelew kirin. Ji lewre jî, ji bo tîknedan û aloz nekirina zimên, divê deng û tîp neyê qelew kirin û şidandin.

Di zimanê kurdî de, bi tenê duçengek (diphthong) heye. Anî, dengên ku ji du tîpan

pêk tên. Ew jî dengê (X) û dengê (W) ne. Navê vê duçengê XW ye. Wek; xweş, xwe, xwê, xwîşk(xweng, xweh), xwastin, xwendin, xwezgî-nî, xwêhdan, xwestek, xwarin, xwende, xwenda, xwar, xwazil(xwezî), vexwarin, vexwendin, dax-waz û hwd.. Nabe ku gotina (xweş) wek xoş, xaş, xuaş bete nivîsandin.

## BERNAVÊN KESÎN

<u>BI SWÊDÎ</u>	<u>BI ELMANÎ</u>	<u>BI ÎNGÎLÎZÎ</u>
PERSONALPRONOMEN	PERSONALPRONOMEN	PERSONAL PRONOUNS
<u>BI KURDÎ</u>	<u>BI SÊDÎ</u>	<u>BI ÎNGÎLÎZÎ</u>
Ez (min)	JAG	ICH
Tu (te)	DU	DU
Ew (wî)	HAN	ER
Ew (wê)	HON	SIE
Em (me)	VI	ES
Hun (we)	NI	WIR
Ew (wan)	DE	IHR
		SIE
		THEY

Nabe ku di şûna -min- de (mi), di şûna -te û tu- de (ti), di şûna -hun- de (hon) û (win) û (hûn), di şûna -ew- de (ewan) û (ewana) û (ewa), di şûna -wan- de (ewan) û (wana) û (wa) û (wanan), di şûna -wî- de (ewî) û (wîna) û (ewîna), di şûna -wê- de (ewê) û (wêna) û (ewêna) bête nivîsandin.

Ev bernavên kesîn yê han, bêtir di zimanê axaftinê de tên bi kar anîn. Lê ne li gor zimanê xwendin û nivîsandinê ne. Wek tê-te zanîn jî, zimanê axaftinê ji yê xwendin û nivîsandinê gelekî cihê ye.



# TEWANDINA LÊKERAN

BI SWÊDÎ

BI ELMANÎ

BI ÎNGÎLÎZÎ

BÖJNING

DEKLINATION

DECLENSION

Heçê lêkera(Verb) BÛN(Bûyîn) e, wek li jêr tête tewandin.

(BÛN) <u>BI KURDÎ</u>	(ATT VARA) <u>BI SWÊDÎ</u>	(SEIN) <u>BI ELMANÎ</u>	(TO BE) <u>BI ÎNGÎLÎZÎ</u>
Ez im	JAG ÄR	ICH BIN	I AM
Tu (y)î	DU ÄR	DU BIST	YOU ARE
	HAN ÄR	ER IST	HE IS
Ew e	HON ÄR	SIE IST	SHE IS
		ES IST	IT IS
Em in	VI ÄR	WIR SIND	WE ARE
Hun in	NI ÄR	IHR SEID	YOU ARE
Ew in	DE ÄR	SIE SIND	THEY ARE

Gava ku dawiya peyva berê lêkerê bi tîpeke bêdeng(konsonant) diqede, lêker li gor bernavan dibe -im-, -i-, -e-, -in-. Wek:

	<u>BI SWÊDÎ</u>	<u>BI ELMANÎ</u>	<u>BI ÎNGÎLÎZÎ</u>
Ez Kurd im.	JAG ÄR KURD.	ICH BIN KURDE.	I AM KURD.
Tu Kurd î.	DU ÄR KURD.	DU BIST KURDE.	YOU ARE KURD.
	HAN ÄR KURD.	ER IST KURDE.	HE IS KURD.
Ew Kurd e.	HON ÄR KURD.	SIE IST KURDE.	SHE IS KURD.
		ES IST KURDE.	IT IS KURD.
Em Kurd in.	VI ÄR KURDER.	WIR SIND KURDEN.	WE ARE KURDS.
Hun Kurd in.	NI ÄR KURDER.	IHR SEID KURDEN.	YOU ARE KURDS.
Ew Kurd in.	DE ÄR KURDER.	SIE SIND KURDEN.	THEY ARE KURDS.

Lê belê, heke dawiya peyva beri lêkerê bi tîpeke dengdar(vokal) biqede, lêker li gor bernavan dibe -me-, -yi-, -ye-, -ne-. Wek:

Ez	Swêdî	me.	JAG ÄR SVENSK	. ICH BIN SCHWEDE	. I AM SWEDE
Tu	Swêdî	yî.	DU ÄR SVENSK	. DU BIST SCHWEDE	. YOU ARE SWEDE
Ew	Swêdî	ye.	HAN ÄR SVENSK	. ER IST SCHWEDE	. HE IS SWEDE
			HON ÄR SVENSK	. SIE IST SCHWEDE	. SHE IS SWEDE
				ES IST SCHWEDE	. IT IS SWEDE
Em	Swêdî	ne.	VI ÄR SVENSKAR.	WIR SIND SCHWEDEN.	WE ARE SWEDES
Hun	Swêdî	ne.	NI ÄR SVENSKAR.	IHR SEID SCHWEDEN.	YOU ARE SWEDES
Ew	Swêdî	ne.	DE ÄR SVENSKAR.	SIE SIND SCHWEDEN.	THEY ARE SWEDES.

Di nivîsandinê de, divê lêker her dem cihê bête nivîsandin. Nabe ku lêker bi peyvên din ve û di gel hev bête nivîsandin. Anê, eger em, "Ez Kurdîm" binivîsin pir şaş e. Divê em, "Ez Kurdîm" binivîsin. Yan na, bingehên rêzimanê kurdî aloz dibê. Lê belê, gava ku em dixwînin, em wê digihînin hev û pev re dibêjin.

### NEYÎNÎ (NEGATION)

Neyînî, di zimanê kurdî de, bi peyvika -NE- ve tête çêkirin. -Ne- bête pêşiya kîjan gotinê, ew gotin bi xwe rengê neyîniyê werdigre. Wek;

Ez	ne	Kurd	im.	JAG ÄR INTE KURD.	ICH BIN KEIN KURDE.	I AM NOT KURD.
Hun	ne	Kurd	in.	NI ÄR INGA KURDER.	IHR SEID KEINE KURDEN.	YOU ARE NOT KURDS.
Ez	ne	Swêdî	me.	JAG ÄR INTE SVENSK.	ICH BIN KEIN SCHWEDE.	I AM NOT SWEDE.
Hun	ne	Swêdî	ne.	NI ÄR INGA SVENSKAR.	IHR SEID KEINE KURDEN.	YOU ARE NOT KURDS.

Mala me ne mezin e. Ava bîrê ne sar e.  
 Kanî ne kûr e. Şêrko ne xwende ye. û hwd.  
 Dûmahîk heye



FERHENGÂ KURDÎ-SWÊDÎ  
Kurdisk - Svensk Ordlista

- Alî : Sida, riktning, håll  
Alî kirin : Att hjälpa, bistå, bidra  
Alîkarî : Hjälp, bidrag, bistånd  
Belav kirin : Att sprida, dela ut, fördela  
Bijî : Heja!, Leve!, Hurra!  
Bi yeko yeko : Ett(en) i taget  
Balafir : Flygplan  
Bêrik : Spade  
Bersiv : Svar  
Bixêrî : Skorsten  
Bizdîn : Att bli rädd, förskräkt  
Bazdan : Att springa, hoppa  
Cotkar : Jordbrukare, Lantbrukare  
Cot kirin : Att plöja  
Cewrik : Valp  
Çap : Tryck, upplaga, uppgåva  
Çap kirin : Att trycka, ge ut, publicera  
Çavnêrî : Väntandet, kontroll, tillsyn  
Çîrok : Saga, berättelse  
Dûrbîn : Kikare  
Dest pêkirin : Att börja, starta  
Dibistan : Skola  
Diranêş : Tandvård  
Dawî : Slut, ändelse  
Dûv : Svans  
Dûvik : Fågel stjärt  
Enî : Panna, front  
Êzing : Ved  
Find : Ljus

Garis : Havre, majs  
Guhastin : Att flytta, transportera  
Gundor : Rullsten  
Gindirandin : Att rulla, rullning  
Gotin : Att säga, berätta, ord  
Hêlîn : Fågelbo  
Hêvî : Förhoppning, hopp  
Hevî kirin : Att be, hoppas, förvänta  
Hejmar : Nummer, siffra, tal  
Hesk : Slev  
Hizir kirin : Att fundera på, överlägga  
Hesinrê : Järnväg  
Incas : Plommon  
Îsot : Paprika  
Jêrîn : Nedan, nedanstående  
Jorîn : Ovan, ovanstående  
Jêbir : Suddgummi  
Kelbetan : Tång  
Kovar : Tidskrift  
Kokel : Koja, hydda, liten stuga  
Kêç : Loppa  
Kezî : Fläta  
Lîstik : Lek  
Lava kirin : Att be  
Lep : Tass  
Misîn : Vattenkanna  
Mamik : Gåta  
Masîgir : Fiskare  
Name : Brev  
Nîşangir : Skytt  
Nanpêj : Bagare, kock






Ordek : Anka  
 Pel : Blad  
 Peyv : Ord, uttryck, tal  
 Peyvîn : Att tala, prata  
 Post : Skin  
 Pirtûk : Bok  
 Pevçûn : Att bråka, bråk  
 Qaz : Gås  
 Qijik : Kråka  
 Rastkêş : Linjal  
 Rastî : Verklighet, sanning, realitet  
 Rojname : Tidning  
 Rojîn : Fönsterglugg, glugg, takfönster  
 Safok : Sil  
 Spîh : Löss  
 Tîravêj : Pilbågskytt  
 Tîp : Bokstav  
 Ūr : Mage  
 Vizik : Snurra  
 Werîs : Lina, rep  
 Weşîn : Att falla ner, singla  
 Weşandin : Att låta falla ner  
 Xal : Morbror  
 Xal : Punkt  
 Xelat : Present, gåva  
 Xweh=xwîşk=xwang : Syster  
 Zevî : Fält, åker  
 Ziman : Språk  
 Ziman : Tunga  
 Zimanê zikmakî : Modersmål  
 Zarava : Dialekt


# BARAN



Baran xwarin bi xwe re bir ku here gerê.









17



18



19



20



21



22



23



24



25



26



27



Wag li min bavo!  
ka kîsê min. Nebe ku  
hîngan biribê?



28

Hi hi hi...



29

Ne ku yên  
han bin!...



30

Wa ye kîsê min!



31



32

We ew kîs ji  
ku aniye?



Wî ji min re got ku  
were em tevde bixwin.  
Lê darek li min xist  
û revî....



Bbbi. Xwedê,  
dema ku tu  
xewê de  
bûyî min  
ji te dîzî.



33

Heka te pirs kiriba  
min ê bida te. Lê te  
ji min dîzî û bi serde  
ji hevalê  
xwe xepand.



34

De werin da  
em tevde herin  
û bixwin!



De rabe melê  
em tevde herin  
û bixwin!



35

De em herin!



37

Malxirabê te di  
melê de ruh ne  
hiştîye.



36

Birako  
ez ji  
nêz de  
mirim!



De kerem  
bikin!

38

Ooo, qiqas xweş e!

Belê pir xweş e!

Mali' ava, min ter xwar!

39

40

Ji lewre jî bav û bapîrên me  
gotine, ku

KEDA HELAL DIBE MÛ JÎ NAQETE

KEDA HERAM DIBE WERIS JI DIQETE!









## Jİ GERGETÊ

Andante

Ji Ger - ge - tê, haj Ger - ge - tê,  
de - lal, xe - za - lê.

Ji Gergetê, ha ji Gergetê, delal, xezalê,  
Ji Gergetê, ha ji Gergetê, delal, delalê,  
Qîrîna dîkê qer tê, xezal, xezalê,  
Qîrîna dîkê qer tê, delal, delalê,  
Şîngîna bazîne zêr tê, xezal, xezalê,  
Şîngîna bazîne zêr tê, delal, delalê.

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENINGEN

WEŞANA

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN